Justiz- und Sicherheitsdepartement des Kantons Basel-Stadt

# Bernameya fêrkariyê li dijî tundûtûjiya navmalî

## Pêşniyazek ji bo mêran û jinan li Basel-Stadt’ê ji bo jiyana bêyî tundûtûjiyê li malbat û peywendiyên jin û mêran



# Gelo tu dizanî?

Di dema gengeşeya digel hevjîn an zarokên xwe da…

…ditirsî ku kontrola xwe ji dest bidî û hesta xeniqînê bikî.

…tu qîriyayî, bêrêzî kiriye an gef xwariye.

…te dehf daye, derbe lêdaye, ava devî avêtiye, lêdan pêk aniye, fetisiye an ditirsî ku van karan pêk bînî.

…tişt û kelûpel ji nav birine an kewkî ser kesên din kirine.

…hest dikî ku kesên din bi tirs bi te ra rûbirû dibin.

Her wiha eger tenê yek ji van babetan rast e: Wê cidî bibîne. Delalên xwe biprêze! Di dema tundûtûjiyê da hemî kes diêşin, nemaze zarokên ku bi awayekî rasterast an nerasterast tûşî vê tundûtûjiyê dibin. Tundûtûjiya navmalî bandoreke nerênî li mezinbûna zarokan dike.

# Yekem pêngava ber bi pêşerojeke bêyî tundûtûjiyê rake!

Beşdarî bernameya fêrkariyê ya li dijî tundûtûjiya navmalî bibe. Bandora wê berbiçav e: Kesên ku beşarî vê bernameya fêrkariyê dibin, kêmtir vedigerin tundûtûjiyê. Beşdar tê digihêjin ku reftara wan a bi tundî çi bandorekê dike, çi dibe sebeba wê û çawa dikarin pêşî lê bigirin.
Ev kûrs ji aliyê pisporên bi bi ezmûn û tecrubeya bi salan di warê tundûtûjiya navmalî va tê birêvebirin.

# Kî dikarin beşdarî vê bernameya fêrkariyê bibin?

Ev bernameya fêrkariyê ji bo wan mzinan e ku di jiyana hevpar a heyî an jinavçûyî da an jî li malbatê tundûtûjî pêk anîne an gefa tundûtûjiyê li an hatiye xwarin.

Piştî tomarkirinê, hevpeyivîna wergitinê digel raberkera kûrsê pêk tê.
Ji bo beşdarên bi zimanê biyanî, werger tê bikaranîn. Ev pêşniyaz belaş e.

# Armancên vê bernameya fêrkariyê çi ne?

- Tu mînaka xwe ji reftar û tevgerên şidetbar tê derdixî.
- Tu xetera vegeriyana xwe bo tundûtûjiyê tê digihêjî û hin rêkaran ji bo pêşîgirtina li vegerê pêk tînî.
- Tu hîn dibî ku bêyî tundûtûjiyê behs û gotûbêj bikî.
- Tu têgihîştina xwe ji xwe û kesên din xurt dikî.
- Tu derheq pisportiyên xwe yên nû-bidestxistî piştarst dibî.

# Tomarkirin:

Ji bo tayînkirina dema hevpeyvîna wergirtinê têkilî dayîne:

Abteilung Gewaltschutz und Opferhilfe
Telefon: +41 (0)61 267 44 90
E-Mail: haeusliche-gewalt@jsd.bs.ch

Berpirsên ku kesekî ji bo bernameya fêrkariyê tomar dikin, tevahiya belgeyên têkildar bo Beşa Parastina ji Tundûtûjiyê û Alîkariya bo Qurbaniyan (Abteilung Gewaltschutz und Opferhilfe) dişînin.

## Weşandî ji aliyê:

**Justiz- und Sicherheitsdepartement Basel-Stadt**
Generalsekretariat
Abteilung Gewaltschutz und Opferhilfe
Spiegelgasse 6, 4001 Basel
www.halt-gewalt.bs.ch

Nivîsîn û Rûpelsazî: bom! communication ag
© 2023